ARAM GERNAS

# Baxçeyê Zarokan



# BAXÇEYÊ ZAROKAN

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A DIYARBEKIRÊ

# BAXÇEYÊ ZAROKAN

(Stran û muzîka zarokan)

Aram GERNAS

*Notasyon:*
Ferîd NADHAR
Enwer QEREDAXÎ

*Îlustrasyon:*
Arîf SEVÎNÇ
Lennart ASP

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A DIYARBEKIRÊ

Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê

**BAXÇEYÊ ZARKOKAN**
(Stran û muzîka zarokan)
Nivîskar: Aram GERNAS
Notasyon: Ferîd Nadhar û Enwer Qeredaxî

**Edîtor**
Li ser navê
Komeleya Nivîskarên Kurd
Azad ZAL

**Sererastkirin:**
Enstîtuya Kurdî ya Amedê (Serwet Denîz)

**Berg û Rûpelsazî:**
Azad ZAL

**Wêneyê Bergê:**
Koroya Zarokan a Şaredariya Bajarê Mezin

**Çapa Yekem:**
Stockholm - 2001

**Çapa Duyem:**
Diyarbekir - 2008

**Çapxane:**
Gün Matbaacılık
Reklam Film Basın Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Adres: Beşyol Mahallesi Akasya Sokak 23/A
Sefaköy Küçükçekmece İSTANBUL
Tlf: (212)580 63 80

ISBN: 978-975-94847-4-3

**TÊKILÎ:**
Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Kültür ve Türizm Müdürlüğü

**TLF/FAX:**
0412 223 49 42 / 0412 229 30 52

**WEB:**
www.diyarbakir.bel.tr

Mafên weşanê parastî ye.

Ji derveyî danasînê bê destûra nivîskar û weşanxaneyê bi tu awayî nayê kopîkirin

Aram GERNAS

# BAXÇEYÊ ZAROKAN

STRANÊN ZAROKAN
Ji bo zarokên 6 salî heta 12 saliyan;
stranên lîstikê, fêrbûnê, perwerdehiyê, şarezayiyê, welatheziyê, xwezaheziyê û wekî din...

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A DIYARBEKIRÊ

*Aram Gernas ji Farqînê ye. Xwendina xwe ya sereta, navîn û lîseyê li vî bajarî temam kiriye. Piştî xwendina Înstîtuya Perwerdehiyê dest bi karê mamosteyiyê kiriye. Di serdema cûntaya eskerî ya 12'ê îlona 1980'yî de gelek caran hatiye girtin û zêrandin. Di sala 1983'yan da wek penaberekî polîtîk derketiye derveyî welat û li Swêdê bi cih bûye. Li wê derê jî, digel xebatên kurdperwerî, nivîskarî û redaktorî, ji nû ve dest bi xwendina Zanîngeha Mamostehiyê ya Bilind kiriye. Her weha piştî xwendina bilind dest bi karê mamostehiya kurdî kiriye. Digel karê mamostehiyê, bi salan karên redaktorî û nivîskariya kovarên Roja Nû, Berbang, Çira û rojnameya Dengê Azadî jî meşandiye.*

*Di gelek kovarên zindî yên Tirkîyê û welat de û di malperên înternetê de gelek nivîsarên wî derçûne. Ev 5 sal in ku vegeriyaye welat û li vê derê dijî. Xebatên wî yên nivîskarîyê, her bi zimanê kurdî ne.*

*Berhemên wî yên derçûyî:*

*1- Şervanê Biçûk ê Vîetnamî (werger-Kurteroman, Weşanên Roja Nû, 1988, Stockholm)*

*2- Zembîlfiroş (Pîyes-Drama, Weşanên Roja Nû, 1995, Stockholm)*

*3- Baxçê Zarokan 1 (Stran û muzîka zarokan, Weşanên Apec, 1997, Stockholm)*

*4- Baxçê Zarokan 2 (Stran û muzîka zarokan, Weşanên Spartryck, 2001, Stockholm)*

*5- Hemend (Çîrok, Weşanên Spartryck, 2001, Stockholm)*

*6- Romeo û Julîet (Werger, Pîyes-Drama, Weşanên Helwest, 2002, Stockholm)*

*7- Bêrî (Werger – Belgeroman, Weşanên Perî, 2002, Îstenbol)*

*8- Aliko och Sparvhöken (Werger bi Swêdî, romanek zarokan, W. Roja Nû, 2005, Stockholm)*

*9 -Toqa Naletê ( Roman, Weşanên Doz, 2007, Îstenbol)*

# AXAFTINA ŞAREDAR

Wezîfeya me ne tenê çêkirina park û rê û der û doran e. Wezîfeya me ya herî girîng ew e ku em ji bo pêşeroja vî gelî, ji bo çand û hunera vî gelî jî bixebitin, li ser navê vî gelî tiştên baş û rind bikin.

Wekî me got pêşeroja vî gelî berê her tiştî zarok dikevin bîra me. Ku em qala pêşeroja xwe bikin divê em zarokan bi bîr bînin. Gava ku em ji bo zarokên vî welatî kar û bar bikin em di heman demê de ji bo pêşeroja xwe jî dikin.

Gava ku mijar zarok bin mirov ji bo wan çi jî bike têr nake, ku ev zarok zarokên kurdan bin ev girîngtir dibe. Zarokên kurdan zaroktiya xwe najîn, di nava şer û pevçûnê de mezin dibin. Zarokên kurdan wekî zarokên dinyayê najîn.

Zarokên kurdan wekî kulîlkên ber devên kaniyên avzelal in, lê ji wê ava zelal têr avê venaxwin. Zarokên kurdan tî û birçiyê aştiyê, azadiyê, xweşiyê, dilşadiyê ne. Zarokên kurdan bi hesreta lîstikên zarokane, yên bi muzîk û şahiyê ne.

Ez di wê baweriyê de me ku heta niha ji bo zarokan zêde tişt nehatine kirin. Bi taybetî jî muzîka zarokan a kurdî gelek kêm e. Stranên zarokan gelek hindik in. Hema bêje tune ne. Gava ku em binihêrin ji her derê dinyayê bêtir îhtiyaca zarokên kurdan bi stranên lîstikê, bi stranên rojê, navên rojên hefteyê, meh û demsalan heye.

Mafê zarokên me jî heye ku bi stranên zarokatiyê serê sibeyan ji xew rabin û bi stranên zarokatiyê êvaran herin nava ciyê xwe û rakevin. Wê demê ew ê bikaribin xewnên aştî û xweşiyê bibînin.

Ji bo ku zarokên me bi hev re bi stranên xweşiyê, stranên lîstikê bilîzin me berhemeke bi tenê ji bo zarokan amade kir û em pêşkêşî zarokên xwe,

pêşeroja xwe dikin.

Pirtûk ji serî heta binî tev stranên zarokan ên ku dinyaya zarokan geş dikin pêk tê. Ez di wê baweriyê de me ku ev stran ew ê ji ser zimanê zarokan nekeve. Li malê, li kuçeyê, li dibistanê, li parkê, li her derên ku ciyê lîstika zarokan e ew ê ev stran bêne gotin. Êdî zarok ew ê bi van stranan bi hev re bilîzin.

Di pirtûkê de stran ligel notayan hene. Ev pirtûk dikare bibe çavkaniya dersên muzîkê jî.

Pirtûk bi pêveka CD'yekê dertê. Ji nav pirtûkê beşek stran ji aliyê Koroya Zarokan a Şaredariya Bajarê Mezin ve hatin hilbijartin. Koroya me bi deng û rengê xwe ev stranên hilbijartî gotin û di CD'yê de hatin bicîkirin. Em di wê heviyê de ne ku ew ê bi dilê zarokên me, kulîlkên ber ava kaniyên zelal be.

Ji bo ku em berhemeke bi vî rengî çap dikin em bextewar û dilgeş in.

Me ev xebat bi hevkariya Komeleya Nivîskarên Kurd pêk anî. Di amadekirin û çapkirina vê berhema giranbuha de keda gelek kesan heye. Ez ji tevan re spas dikim û dibêjim em ê her tim xizmetên bi vî rengî bikin û zarokên xwe ji berhemên wiha bêpar nehêlin.

*Prz. Osman BAYDEMIR*

*Şaredarê Bajarê Mezin ê Diyarbekirê*

# NaveroK


**Axaftina Şaredar** ........ 5
**Pêşgotin** ........ 9
**Dibistan** /Awaz û peyv: A.Gernas ........ 13
**Marşa Tîpan** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 14
**Alfabeya me** / Awaz û peyv: A.Gernas........16
**Roj** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 18
**Demsal** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 20
**Rojên hefteyê** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 22
**Anatomiya laş** / Awaz : Ferîd Nadhar / Peyv : A.Gernas ........ 24
**Organên me**/waz û peyv: A.Gernas........ 26
**Amûrên me** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 28
**Dinyaya me**/ Awaz û peyv: A.Gernas........ 30
**Katjimêr** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 32
**Rêwîkêş** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 34
**Keskesor** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 36
**Rojbûn** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 38
**Here here** / Awaz : Sabah Muhemmed /Peyv : A.Gernas ........ 40
**Hirço** /Awaz : A.Gernas /Awaz û peyv : Xweşnav ........ 42
**Veşartok** /Awaz û peyv: A.Gernas ........ 44
**Trên** / Awaz û peyv : Xweşnav ........ 46
**Muzîk derman e** /Awaz û peyv: A.Gernas ........48
**Strana Trafîkê** /Awaz û peyv: A.Gernas ........ 50
**Rojbaş** / Awaz: A.Gernas, peyv:Kemal Burkay........52
**Em bi hev rebilîzin** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 54
**Yek û du** / Awaz: Enwer Qeredaxî, peyv: A.Gernas ........ 56
**Wek min** / Awaz: Enwer Qeredaxî, peyv: A.Gernas ........ 58
**Tinaz** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 60
**Werdekê** / Awaz û peyv: Xweşnav ........ 62
**Heywanên me** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 64
**Kew** / Awaz: Ferîd Nadhar, peyv: A.Gernas ........ 66
**Bebe bebe biçûko** / Awaz: Ferîd Nadhar, peyv: A.Gernas ........ 68
**Keça min a biçûk** / Awaz: Aram Gernas, peyv: Kemal Burkay ........70
**Şîret** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 72
**Ez zarok im pirs dikim** / Awaz û peyv: A.Gernas........ 74

**Malbata min** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 77
**Keçeke Porzêrîn** Awaz û peyv: A.Gernas ........ 78
**Banga zarokan** / Peyv û awaz : A. Gernas ........ 80
**Hechecik** / Awaz: A. Gernas, peyv: Kemal Burkay ........ 82
**Berf û baran** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 84
**Aştîxwaz im** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 85
**Av û çiyayên nîştiman** / Peyv û awaz : A. Gernas ........ 86
**Newroz** / Awaz: Enwer Qeredaxî, peyv: A.Gernas ........ 88
**Pêşiyên me** / Awaz û Peyv : A.Gernas ........ 90
**Daxuyanî** / Awaz û Peyv : A.Gernas ........ 92
**Dîlana Biratî** / Awaz :Biyanî - Peyv : A.Gernas ........ 94
**Meşa mindalan** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 96
**Zû ne dereng** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 98
**Hevala min** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 100
**Mala min** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 102
**Şît û zîrek** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 104
**Baran** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 106
**Kerguh** / Awaz: Ferîd Nadhar - peyv: A.Gernas ........ 108
**Hilperîn** / Awaz: Ferîd Nadhar - peyv: A.Gernas ........ 110
**Dayê can** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 112
**Zanîn** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 114
**Tiral** / Awaz: Enwer Qeredaxî - peyv: A.Gernas ........ 116
**Pêşwazî** / Awaz: Ferîd Nadhar - peyv: A.Gernas ........ 118
**Silav** / Awaz: Enwer Qeredaxî - peyv: A.Gernas ........ 120
**Bi xêr hatin** / Awaz û peyv: A.Gernas ........ 122
**Koroya Zarokan a Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê** ........ 125
**Wêneyên koroya zarokan** ........ 127

# PÊŞGOTIN

Serdema zarokî, destpêka hînbûna hemû tiştî ye. Li pêşberî dê û bavan, mamoste û perwerdekaran jîndarek birçî, birçiyê hemû tiştên derdora xwe heye. Bê westan meraq dike, pirs dike û bersîvan dixwaze. Her bersivek dibe wêneyek di serê wî/wê de û pirsek nû peyda dike. Ango li pêşberî me mêjiyek neprogramkirî heye û divê perwerdekarên zarokan çanda me, jiyana me ya civakî, sîstema jiyanê û çalakiyên însan bi gelek şêweyan (metodan) di mêjiyê zarokan da bi cî bikin û wan ji pêşerojê re amade bikin.

Di perwerdekirina zarokan da muzîk cihek sereke digre û di vî warî da rol û bandora muzîkê bi dehan car hatiye îspatkirin. Werçerxînên ku bi riya muzîkê di zarokan de peyda dibe çi ne?

- Berî her tiştî zarok fêrî bixwebawerbûnê dibin, lewra muzîk metodeke efektîv e û bi hêsanî şerma zarokan direvîne.

- Zarok bi riya muzîkê, ji hemû şêweyên perwerdekirinê hêsantir karin hestên dilê xwe yên hepiskirî derxînin derve.

- Bi aşkerakirina hestan, gevilên wan dertê meydanê û wêneyek zelaltir radixe pêş çavê perwerdekaran da ku ew karibin zarokan ber bi pêşerojek serketî ve bibin.

- Bi riya muzîkê zarok, karin hêsantir beşdarî xebatên civakî û yên hevpar bibin û di wê xebatê da karin keda xwe bibînin û bibin xwedî tecrûbe.

- Bi vê şêweyê fêrî bikaranîn û kontrolkirina dengê xwe dibin.

- Bi vê riyê gelek stranan hîn dibin û bi her stranekê re fêrî hin tiştan dibin.

- Bi riya muzîkê pirdengiyê nas dikin û jê hez dikin.

- Muzîk li ser tevgera zarokan bandoreke baş çêdike da ku karibin bi rîtm û pîvan bilivin, ango kontrola motorî pêş bixin.

- Muzîk gevilên afirandêriyê bi pêş dixe.

- Xusûsiyetên guhdarîkirinê pêş ve dibe, baldayînê xurt dike, riya lêhûrbûnê fêr dike.

- Zîrekiya mêjî pê vedibe û fam û ferasetê peyda dike.

- Komunîkasyona navbera însanan hêsantir dike.

- Komînîkasyona navbera kulturên dinyayê hêsantir dike.

- Alîkariya fêrbûna zimanek an jî hin zimanên din dike.

- Dilnermî û dilpakiyê xurt dike, li hember pirsgirêkan û çareseriya wan bêhn-

firehî peyda dike, zarokan ji êrîşkariyê û karên bi xesar dûr dixe.

- Hestên neteweyî pêş va dibe û mecala nasîna kultura xwe, urf û adetên xwe peyda dike... û hwd.

Bêguman hêj gelek taybetmendiyên bikêr ên muzîkê hene ku roleke mezin li ser pêşketin û perwerdekirina zarokan dilîzin, lê kurtehevoka dagirtî ya Friedrich Wilhelm Nietzsche bersîva gelek tiştan dide : ***"Bê muzîk, jiyan qusûrek e."***

Em bawer in ku ev pirtûk wê bibe materyaleke bingehîn bo mamosteyên muzîkê û her wisa bibe alîkarê perwerde û pêşketina zarokan.

Wek rêbernameya bikaranîna pirtûkê, pêwîstî bi destnîşankirina çend agahiyan jî heye. Bi kurtî ev in:

1- Ji bo her stranek û notaya wê rûpelek hatiye veqetandin. Li quncê jorîn ê çepê ya ALLEGRO yan jî MODERATO hatiye nivîsandin. *Allegro:* Ji bo muzîk û stranên lezgîn e. *Moderato:* Ji bo muzîk û stranên giran e.

2- Li serê rûpelê navê stranê hatiye nivisandin. Wek mînak, *Rojbaş* an jî *Bebe bebe.*

3- Li quncê jorîn ê rastê navê afirandêrê stran û awaza wê hatiye pêşkêşkirin. Wek mînak: *"Peyv û Awaz: Aram Gernas"* yan jî *"Peyv: Aram gernas", "Awaz: Enwer Qeredaxî"* û herwisa daxuyanî di naverokê da jî, ji bo her stranek hatiye nivîsandin.

4- Gotinên stranan ya digel hev yan jî li kêleka hev hatine beşkirin.

5- Her stranek li gor guherîna muzîkê bi tîpên A,B - A,B,C - A,B,C,D - A,B,C,D,E hatine nîşankirin. Ev nîşan him li ser beşên notayan him jî li ser peyvên stranan hatine bi cîh kirin. Wek mînak:

*A Bebe be biçûko*

*Megrî megrî berxiko*

*B Destê dayê girtiye*

*Ez li ba te biçûko*

Wateya van îşaretan ew e ku gotinên stranê wek muzîka beşa A tê strandin an jî xwendin; beşa B jî wek B tê strandin...

6- Wêneyên ku di pirtûkê de cîh girtine bê reng in. Zarok dikarin van wêneyan bi kêfa xwe boyax bikin an ji reng bidinê.

7- Wêneyên ku nimroyên rûpelên wan hatine nivîsîn ji alî wênesaz Arîf Sevînç ve hatine çêkirin. Wêne û nimroyên wan ev in: 12, 16, 20, 26, 30, 32, 34, 36, 46, 48, 54, 56, 70, 84, 86, 88, 90, 92, 94, 96, 104, 106, 112, 116, 118.

8- Wêneyên din ji aliyê Lennart Asp va hatine çêkirin.

Aram GERNAS

# BAXÇEYÊ ZAROKAN

STRANÊN ZAROKAN


Ji bo zarokên 6 salî heta 12 saliyan;

stranên lîstikê, fêrbûnê, perwerdehiyê, şarezayiyê, welatheziyê, xwezaheziyê û wekî din...



# DIBISTAN

*Awaz û Peyv: A.Gernas*




Sibehê zû radibim
Ser û çavê xwe dişom
Têr dixwim taştêya xwe
Li xwe dikim çekên xwe

Çentê xwe didim milan
Berê xwe didim dibistan
Bi rojbaş dest pê dike
Dersa kurdî ser çavan


Dibistan çiqas xweş e
Mamoste tim rûgeş e
Fêr dibim gelek tiştan
Davêjim xem û derdan


Ez dikarim bixwînim
Bixwînim û binvîsim
Êdî ji tiştek natirsim
Bi dinyayê dihesim


# MARŞA TÎPAN


*Peyv : Hisênê Emîn*
*Awaz : A.Gernas*

ALLEGRO








A    Em şagirt in, em dixwînin **A, B, C**
     Nivîsandin, ew ji me ra armanc e
B    Tîpên me tev sih û yek in **Ç, D, E**
     Xweşî ev e, bi zimanê Kurdî ye


A    **Ê, F, G**, H him rihet e, him şîrîn
     **I, Î, J, K** xweş dixwînim bi qîrîn
B    **L, M, N, O** hê mane çendekên din
     Gelî kurdan, werin tev de bixwînin

A    **P, Q, R, S, Ş, T, U, Û** tu mêze
     **V, W, X** ne, ez şaş nakim yek levze
B    Heşt dengdêr in, herçî dengdar bîst û sê
     Riya ronî dibistan e, ma **Y, Z**



# ALFABEYA ME

*Awaz û peyv : A.Gernas*






**B** **Ber**f û **Ba**ran, **Ba** û **Ba**ger, **bi** tîpa **B** dest pê dikin
**C** **Ci**lik û **Ca**w, **Ca**n û **Ca**nan, **Ca**r û **Ca**rna li hev dikin
**Ç** **Ç**i û **Ç**ima, **Ç**end û **Ç**awa, bi hostayî pirsan dikin
**D** **D**ar û **D**evî, **D**er û **D**ever, **D**û û **D**ûxan **d**awet dikin

**F** **F**êkî ji dar, **F**iro ji şîr, **F**irçe ji mû çêdibe
**G** **G**uvîj û **G**ûz, **G**ûlik, **G**êzer, **G**aris **G**enim xurekên me
**X** **X**al û **X**altî, **X**wîşk û **X**warzî, çend nav in ji malbata me
**H** **H**eft û **H**eftê, **H**eşt û **H**eştê, **H**ivdeh, **H**ijdeh **h**ejmarên me

**J** **J**îr û zîrek, **J**an û **J**ehrî, **J**êr û **J**orîn bi harmonî
**Q** **Q**am û bejin, **Q**al û bela, xweş li hev tên **Q**az û **Q**umrî
**K** **K**errî, **K**orî, **K**ulek, **K**otî tên naskirin wek seqetî
**L** **L**ehî, **L**orîn, **L**aleş, **L**eyla me wek nav li keçan danî

**M** Mezin nîn in Mêş û Mûrî, biçûk nîn in ga Mange
**N** Nû û Nûjen, Nexş û Nîgar, Nav û pêşnav hevmane ne
**P** Paqij û Pîs, Pêş û Paşî, Pîr û ciwan dijmane ne
**R** Rast û durist, Rê û Rêçik, Reng û Rûçik biwêjên me
**S** Serê Sibê, Sar û Seqem didim Ser rê bo fêrbûnê
**Ş** Şêr heywan e, Şîv xwarin e, Şop rêçik e, Şil avî ye
**T** Ter Teze ye, Tev hemû ye, Tam lezet e, Tarî şev e
**V** Vir derew e, Vîn viyan e, Vejîn jîn e, Vizîn deng e





**W** War Welat e, Wax axîn e, Wêne resm e, Wek mîna ye
**Y** Yar heval e, Yal alî ye, Yarî henek, Yekşem roj e
**Z** Zarokên Kurd, Zaf Zana ne, hez dikin ji Zimanê xwe

**A** Azad dikin ew Axa xwe, bilind dikin ew Ala xwe
**E** Em Emîn in, Eger Em tev hez bikin ji welatê xwe
**Ê** Êl û eşîr Êdî tev de, em dizanin bi Êşa xwe
**I**
**Î** Îro tu xwe bixemlîne, Îşev serê sala nû ye
**O** Ola Kurda ya kevnar e, Êzdîtî ye tu nas bike
**U**
**Û**




*(Divê ev stran wek stranek jiberkirinê neyê pejirandin. Ev, ji bo zarokên ku teze dest bi dibistanê kirine û fêrî alfabeyê dibin, strana alîkariyê ye. Divê beş bi beş, parçe bi parçe bête fêrkirin da ku bi riya muzîkê fêrkirina alfabeyê hêsantir bibe û hewesê çêbike.)*


# ROJ

*Awaz û peyv :* ***A.Gernas***





Ronî dibe dinya
Bi tîrêjên rojê
Bêhêz dibe serma
Bi germiya rojê
Ronî û germ e roj
Hêz û jiyan e roj

Saya serê rojê
Ber digre darûber
Saya serê rojê
Jîndar dibe her der
Ronî û germ e roj
Hêz û jiyan e roj



# DEMSAL

*Awaz û peyv : A.Gernas*









Kanûn, Çile û Sibat
Demsala zivistan hat
Berfê sipî kir axê
Serma bi ser me da hat


Adar, Nîsan û Gulan
Bihar li deşt û çiyan
Gul û nêrgiz û çîçek
Vedijenînin jiyan

Hezîran, Tîrmeh û Tebax
Havîn e germ dibe ax
Zer dibe ceh û genim
Mişmiş sor bûne li şax

Îlon, cotmeh û Çirî
Payîz e ba dike vîzîn
Diweşin pelê daran
Reş dibe esmanê şîn








# ROJÊN HEFTEYÊ

*Awaz û peyv : A.Gernas*






Her hefteyek heft roj e
Ka li dû min bibêje

Duşem roja yekem e
Dest pê dike xwendin e
Sêşem roja duyem e
Çarşem roja sêyem e

Li dû wê tê Pêncşem e
Roja li dû tê, În e
Xwendin, kar radiweste
Zarok bi kêf û şahî ne

Ji hefteyê dimîne
Her du rojên dawî ne
Şemî roja şeşem e
Yekşem roja heftem e



Temam bûn rojên heftê
Hefteyek nû li dû tê



# ANATOMIYA LAŞ

*Awaz : Farîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*




Endamên laş dizanim
Mamoste ez fêr kirim

Por û ser û navçavan
Du birûyên reşkevan

Bijang û du çavên ciwan
Du guhên xweşik û pan


Pozek du qul tê de ne
Bo bêhngirtin û hewa ne

Dev û ziman û diran
Digel çenekî pir ciwan

Du mil û du zendên zexm
Deh tilî û du destên germ

Sing û navpişt û zik
L´ser du ling û du qorik

Bi du pê û deh pêçî
Digerin em cî bi cî





| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1- Serî | 2- Por | 3- Enî | 4- Bijang | 5- Çav | 6- Guh | 7- Poz |
| 8- Dev | 9- Stû | 10- Mil | 11- Çene | 12- Dest | 13- Tilî | 14- Sîng |
| 15- Zik | 16- Ran | 17- Çok | 18- Çîp | 19- Gûzik | 20- Pê | 21- Pêçî |

# ORGANÊN ME

*Awaz ü peyv : A. Gernas*






Dibhîzin bi guhên xwe
Dibînin bi çavên xwe
Bêhn dikin bi pozê xwe
Nan dixwin bi devê xwe



La la la la tra la la
La la la la tra la la



Bazdidin em bi piyan
Kar dikin em bi destan
Dijmêrin bi tiliyan
Dipeyîvin bi ziman

La la la la tra la la
La la la la tra la la



# AMÛRÊN ME

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Bi alfabeya şîrîn
Fêrî xwendinê dibim

Bi pênûsa li dest
Karim xweş binivîsim

Bi çenteyê milê xwe
Hildigrim pirtûkên xwe

Bi firçeya diranan
Diranên min wek mircan


Bi berçavka ber çavan
Ez dibînim pir ciwan
***(Hûn jî karin li ba xwe hin amûrên din li stranê zêde bikin)***


ALFABE

# DINYAYA ME

*Awaz û peyv : A.Gernas*







| | | | |
|---|---|---|---|
| | Dinya me gilover e | | Dinya me gilover e |
| **A** | Li dora xwe digere | **A** | Bi çiya, dar û ber e |
| | Dema ger temam dibe | | Av û hewa û ber e |
| | Şev û rojek çêdibe | | Cih, meskenê jîndar e |
| **B** | Dinya me gilover e | **B** | Tê da dijî însan e |
| | Dora rojê digere | | Teyr û tirûd û heywan e |
| **C** | Dema ger temam dibe | **C** | Mêş û morî û kêzik |
| | Sal dozdeh meh çêdibe | | Hemû cure bi can e |

# KATJIMÊR

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Katjimêr im
Dem jiber im
Sal dozdeh meh
Ez şiyar im
Tîk tak, tîk tak
Tik tak tak tak
Tîkî tîkî tîkî tîkî tak
Bi deqeyan
Bi saniyan
Nîşan didim
Dem û çaxan
Tîk tak, tîk tak
Tik tak, tak, tak
Tîkî tîkî tîkî tîkî tak
Bo xwendevan
Bo karmendan
Ez rêber im
Hemû deman
Tîk tak, tîk tak
Tik tak tak tak
Tîkî tîkî tîkî tîkî tak



# RÊWÎKÊŞ

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Wek malokan li dû hev e
Ne kin e ew, pir dirêj e
Ser rêya hesin dimeşe
Ew çi ye, de ka tu bêje

Çik çik çik çik çik çik çik çik
Ez dizanim ew TRÊN e

Him biçûk e, him mezin e
Rêwîtî pê gelek xweş e
Li ser avê ew dimeşe
Ew çi ye, de ka tu bêje


Xuşşş, xuşşş, xuşşş, xuşşş
Ez dizanim ew KEŞTÎ ye


Dirûvê teyran pê dikeve
Li ser ewran ew difire
Rêya rokek dike katek
Ew çi ye, de ka tu bêje


Pir pir pir pir pir pir pir pir
Ez zanim ew BALAFIR e


Gelek texlîdên wê hene
Meriv her dem wan dibîne
Ser çar tekelan dimeşe
Ew çi ye, de ka tu bêje

Vimmm, vimmm, vimmm, vimmm
Ez zanim ew EREBE ye









# KESKESOR

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Hin caran baran
Hûr hûr dibare
Li serya ewran
Aşkera dibe
Keskesor rengîn
Keskesor şîrîn
Hûn xwe bidin bin
Miraz bixwazin
Çemberek şîrîn
Sor û zer û şîn
Mor, kesk, qawinî
Şeş xetên rengîn
Keskesor rengîn
Keskesor şîrîn
Hûn xwe bidin bin
Miraz bixwazin

Di ronahiya
Rojê de henin
Hemû ew rengên
Ku em nas dikin
Keskesor rengîn
Keskesor şîrîn
Hûn xwe bidin bin
Miraz bixwazin
Tîrêjên rojê
Wek rengên cuda
Ji hev ved'qetin
Nav dilopan de
Keskesor rengîn
Keskesor şîrîn
Hûn xwe bidin bin
Miraz bixwazin



# ROJBÛN

*Awaz û peyv : A. Gernas*




Rojbûna te pîroz be
Emrê te pir dirêj be
Xweş bî, şa bî, pîr nebî
Bext sipî, serketî bî


Rojbûna te pîroz be
Bê xem û bê serêş be
B'mal û milk û malbat be
Rojbûna te pîroz be

Bijî bijî, bijî bijî
Bijî bijî tu bijî


Rojbûna te pîroz be...
Bariş SEYDVAN

# HERE HERE

*Awaz : Sebah Muhemmed*
*Peyv : A.Gernas*






Here here de here
Nalîzim ez digel te
Tu lawek şêt û har î
Nizanî çi ne yar î

Dar dikşînî bi ser me
Cil didirînî li ber me
Bi bazdan diçî ser mil
Davêjî ax û kevir

Ya daf didî nişka va
Birîn dikî dêm, çava
Wek min nîn î nerhet î
Her fêr bûyî çêr bikî

Heta wa bî de here
Nalîzim ez digel te
Dinya lîstik buhişt e
Lîstikvan wek firîşt e





# HIRÇO

*Awaz û peyv : Xweşnav*




Hirço hirço rabe ji xew
Binhêr li dinya bedew
Der û dor şîn bûne
Çûk ji kêfa dixwîne

Pisîk dibê miyaw miyaw miyaw
Kûçik dibê hew hew hew

Hirço bes e te çi divî
Ji te ra tasek hungivî
Hirço bes e rabe ji xew
Bibhîze qebqeba kew


Werdek dibê waq waq waq
Legleg dibê laq laq laq


ZZZZZZZ!


MiYAW! HEW,HEW!
WAQ, WAQ! LAQ, LAQ!

# VEŞARTOK

*Awaz û peyv : A. Gernas*




Zarokek:
Were Zozan
Were Dîlan
Em bilîzin
Veşartokê


Zarokek:
Were Diyar
Were Sîdar
Em bilîzin
Veşartokê

Dîlan:
Kî digre
Kî digre
Çavê xwe
Kî digre

Zarokek:
Heta bîstî
Em dijmêrin
Li kê keve
Ew ê bigre

Diyar:
De baş e
Bijmêre
Zozanê
Tu bijmêre


Zozan:
“Yekê yekê
Yekanekê
Gula çepê
Çepil mijê
Dosta înê
Çû mizgînê
Heba tirî
Vegindirî
Çam û çe ye
Qulqule ye
Tu xwe bigre
Bîst li te ye”


Were Zozan Were Dîlan Em bilîzin Veşartokê
"Yekê yekê Yekanekê Gula çepê Çepil mijê Dosta înê Çû mizgînê Heba tirî Vegindirî Çam û çe ye Qulqule ye Tu xwe bigre Bîst li te ye"



# TRÊN

*Awaz û peyv : Xweşnav*




Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trên wa çû
Çik çik çik çik çik çik çik çik
Me da dû


Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trêna me ya rengîn e
Çik çik çik çik çik çik çik çik
Bar li dû xwe dikşîne

Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trên wa çû

Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trên wa çû
Çik çik çik çik çik çik çik çik
Me da dû


Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trêna me ya dirêj e
Çik çik çik çik çik çik çik çik
Strana bo me dibêje

Çik çik çik çik çik çik çik çik
Trên wa çû



# MUZÎK DERMAN E

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Wek sitranek bixwîne
Hestên xwe bikelîne
Nav dilê xwe bibîne
Xemên xwe biweşîne
    Muzîk derman e bo te
    Derd û kulan der dike

Bi muzîkê bibêje
Peyvên negotî yên xwe
Şermokiyê bavêje
Bi tenê neponije
    Muzîk derman e bo te
    Derd û kulan der dike



# STRANA TRAFÎKÊ

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Gava dertêm ji malê
Û diçim dibistanê
Xwe nadim nava rêyan
Didim rêya peyayan


Lembeya sor, raweste
Lembeya zer, baldar be
Lembeya kesk, derbas be

Heye him bo rêwiyan
Him ji bo erebeyan
Lembeya trafîkê
Ya ku rêberî dike

Lembeya sor, raweste
Lembeya zer, baldar be
Lembeya kesk, derbas be

Gava lembê dibînim
Eger sor be radwestim
Di zer de amade me
Di kesk de derbas dibim

Lembeya sor, raweste
Lembeya zer, baldar be
Lembeya kesk, derbas be


DIBISTAN

# ROJ BAŞ

*Awaz : A. Gernas*
*Peyv : Kemal Burkay*




Rojbaş dinya
Rojbaş jiyan
Rojbaş ewrên
Reş û sipî

Dar ber, giya
Mêş û morî
Roj baş roja
Zer û sorî

Gulên rengîn
Çûkên dengîn
Roj baş zinar
Zozan û war

Geliyê kûr
Çiyayê dûr
Ava çirik
Gula dirik

Ba û baran
Rojbaş jiyan
Rojbaş dinya
Rojbaş jiyan



# EM BI HEV RA BILÎZIN

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Destê rast û destê çep
Bi hev re dikin çep çep

Bi destên xwe dinvîsin
Bi çavên xwe dibînin
Bi guhên xwe dibhîzin
Û li gel hev em dilîzin


La la la la la la la
La la la la la la la

Destê rast û destê çep
Bi hev re dikin çep çep



# YEK Û DU

*Awaz : Enwer Qeredaxî*
*Peyv : A. Gernas*




Yek û du
darê sêv û darê tû
Sê û çar
min nanê êvarê xwar
Pênc û şeş
dinvîsim ser textê reş
Heft û heşt
çûm Amedê ji bo geşt
Neh û deh
salek dike dozdeh meh
Yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh



# WEK MIN

*Awaz : Enwer Qeredaxî*
*Peyv : A.Gernas*





Ha ha ha her weha
Wek min bikin niha
Çok bişkênin ha ha
Bişkênin hûn niha
Ha ha ha ha ha ha
Hûn rûnên her weha


Ha ha ha her weha
Wek min bikin niha
Ragrin kêr û çetel
Nan bixwin her weha
Ha ha ha ha ha ha
Av vexwin her weha


Ha ha ha her weha
Wek min bikin niha
Dest û dev hûn bişon
Piştî xwarinê ha
Ha ha ha ha ha ha
Piştre ziwa kin weha

*(Mamoste yan jî zarokek dertê pêşberî zarokan, bi hereketên reqsane him stranê dibêje him jî bi zarokan dide strandin û kiryarên di stranê da têne pêşandan. Mamoste dikare li ba xwe hin tiştên din jî lê zêde ke)*









# TINAZ

*Awaz û peyv : A.Gernas*






Ha ha, ha ha ha
Ha ha, ha ha ha
Tu mindalekî biçûk î
Tim ber derî digerî
Ser û çav bi gemar î
Bo şekirek digirî

Ha ha, ha ha ha
Ha ha, ha ha ha
Em nalîzin bi te re
Napeyîvin bi te re
Em diçin dibistanê
Em fêr dibin xwendinê

Ha ha, ha ha ha
Ha ha, ha ha ha
Hûn jî wek min mindal bûn
Ser û çav bi gemar bûn
Qure nebin tu caran
Qedir bidin biçûkan

Ha ha, ha ha ha
Ha ha, ha ha ha
Tu biçûkek delal î
Zîrek û bi aqil î
Guh nede gotinên me
Wer bi me re bilîze
Ha ha, ha ha ha
Ha ha, ha ha ha





# WERDEKÊ

*Awaz û peyv : Xweşnav*



Bi şêweya axaftinê
Yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft
Hîç tiştek tune zehmet
Heft û heşt û neh û deh
Çar hefte dibin yek meh



Werdekê rengşînê
Tu bi ku de dilezînê
Werdekê rengşînê
Rê diçe, xwe dihejîne


Werdek:
Kuwak wak wak
Wak wak wak wak
Kuwak wak?..

Ez ne tenê rengşîn im
Ez xemlandî û rengîn im
Zanim binvîsim, bixwînim
Li dibistan yekemîn im



Zarok:
Ha ha ha ha ha ha ha
Werdekê derewînê
Tu pêşiya xwe nabînî
Werdekê derewînê
Tu ji ku zanî bixwînê

Werdek:
Yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft
Hîç tiştek tune zehmet
Heft û heşt û neh û deh
Çar hefte dibin yek meh





Zarok:
Wawwwww!...

Werdekê şêrînê
Tu xwe ji me nexeydînê
Tu werdekek nazdar î
Digel me bike yarî

# HEYWANÊN ME

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Bizina reş dizê
Karikek tê dinê
Bizina reş dizê
Karikek tê
Bee, bee, be be be
Bee, bee, be be be
Be be be



Miha belek dizê
Berxikek tê dinê
Mîha belek dizê
Berxikek tê
Mee, mee, me me me
Mee, mee, me me me
Me me me




Çêleka bor dizê
Golikek tê dinê
Çêleka bor dizê
Golikek tê
Moo, moo, mo mo mo
Moo, moo, mo mo mo
Mo mo mo
Kûçik diteliqe
Cewrikek tê dinê
Kûçik diteliqe
Cewrikek tê
Hew, hew, hew hew hew
Hew, hew, hew hew hew
Hew hew hew




Mihîna qer dizê
Caniyek tê dinê
Mihîna qer dizê
Caniyek tê
Hîî, hîî, hî hî hî
Hîî, hîî, hî hî hî
Hî hî hî
Pisîk diteliqe
Têjikek tê dinê
Pisîk diteliqe
Têjikek tê
Miyaw, miyaw, miyaw miyaw miyaw
Miyaw, miyaw, miyaw miyaw miyaw
Miyaw, miyaw, miyaw

Kera reş dizê
Daşikek tê dinê
Kera reş dizê
Daşikek tê
Haî, haî, ha ha hî
Haî, haî, ha ha hî
Haha hî
Mirîşk qup dikeve
Çûçik ji hêkê dertê
Mirîşk qup dikeve
Çûçik ji hêkê
Qit, qit, qit qidak
Qit, qit, qit qidak
Qit qidak

# KEW

*Awaz : Ferîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*




Ez keweke zor ciwan im
Tim li şax û geliyan im
Li nav bax û gulan im
Binevşa ser şaxan im

Qaqibo qaqibo qaqibo qaq

Gerdena min deqdeqî ye
Nikul sor bask xetxetî ye
Çavêm hûr û dûrbîn e
Dengê min wek şimşal e

Qaqibo qaqibo qaqibo qaq


QAQIBO! QAQIBO!

# BEBE BEBE BIÇÛKO

*Awaz : Ferîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*





Bebe bebe biçûko
Megrî megrî berxiko
Destê dayê di kar de
Ez li ba te biçûko

Ez jî her çend mindal im
Xerîkê îşê mal im
Ji ter morî û xirxal
Ha babeta galegal


Bebe bikene jîr be
Bes e çaverê şîr be
Ev giryan û ev hawar
Karê kesê betal e


Ku mezin bûy bebe can
Xwengê nabexşe giryan
Piştre dayê dide şîr
Razê razê bibe jîr



# KEÇA MIN A BIÇÛK

*Awaz : A. Gernas*
*Peyv : Kemal Burkay*





Keça min a biçûk, bêje ji min re
Dar çima evîndarê ezman in?
Çivîk çima kilaman dibêjin
Dema roj hiltê, roj diçe ava

Keça min a biçûk, bêje ji min re
Dilê zarokan û xem û şaya wan
Di kîjan baranê de têne şûştin?
Di kîjan ronahiyê da dikenin?

Keça min a biçûk, bêje ji min re
Xerîbiyê, hêvî û hawarê
Roj û şevên ji jan û êşan tên
Bi hezar rengê xewn û xeyalan

Keça min a biçûk, bêje ji min re
Te ji kîjan çiya, çavkaniyê dot
Hêsirên şayiyê, ken û giriyê
Sivik û zelal in, wek pirpirik in


# ŞÎRET

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Yek bi te re bipeyve
Tê çi bikî, çi bikî?
Ez ê guhdarî bikim
Paşê peyva xwe bêjim
Ger xwarin hat ser masê
Tê çi bikî, çi bikî?
Ez ê têrî xwe bixwim
Bi ser xwe de nerêjim
Eger dê û bav bêjin
Çaxê te yê razanê?
Ez ê bêjim ser çava
Bikevim nava ciya
Tu herî dibistanê
Tê çi bikî, çi bikî?
Ez xwe didim xwendinê
Nivîsîn û zanînê

***(Bi şêweya pirs û bersîv, mamoste karin gelek şîretên perwerdekirinê li vê stranê zêde bikin)***







# ZANISTÎ


*Awaz : Enwer Qeredaxî*
*Peyv : A. Gernas*






Bi zanist û bîrê pak
La la la la la la la
Bi huner û kiryarên çak
La la la la la la la
Daxwaz û armanca zêrîn
Stran dibên ji bo jîn
Dinya pîr dikin bi awaz

Li dîlanên pir naz û raz
Narevin û bi dildarî
Bi dahênan û kar fêrbûn
Bijî kar
Bijî dahênan
Bijî huner
Bijî jiyan



# EZ ZAROK IM PIRS DIKIM

*Awaz û peyv : A. Gernas*





Bi navekî têm nasîn
Bo min bûye tirsa jîn
Ji rengekî hez dikim
Nikarim xwe nêz bikim
**Ez zarok im pirs dikim**
**Ev çi îş e fam nakim**
Dîlanên ez dilîzim
Ji min hatine dizîn
Stranên ez dixwînim
Ji min hatine dizîn

**Ez zarok im pirs dikim**
**Bo çi dizî?.. fam nakim**
Zimanek dipeyivim
Nikarim binivîsim
Li welatek rûdinêm
Nikarim bi nav bikim
**Zarok im qebûl nakim**
**Tirs û zorê nas nakim**
**Dixwazim xwe nas bikim**
**Xwe bêtirs bi nav bikim**

# KEÇEKE PORZERÎN

*Awaz û peyv : A. Gernas*





Keçeke porzêrîn
Pir bi tirs û girîn
Dora xwe dinêre
Bi çavên keskeşîn

Ne tu dê û ne jî bav
Ne tu xwîşk û bira
Ne tu sitar û ban
Bi tena serê xwe

Ew keça porzêrîn
Bi çavên keskeşîn
Li hewa dinêre
Bi gef û pir bi kîn

Balafirên lîstok
Bûne wek ejderha
Heta bêjî berdok
Dimînî li derva

# BANGA ZAROKAN


*Awaz û peyv : A. Gernas*




Em dixwazin
Li dinyayek
Bijîn têr û şa

Em dixwazin
Li dinyayek
Bijîn bê şeran

Dinyayekî
Bi hevdemî
Dinyayekî
Bi harmonî



Dinyayekî
Dinyayekî
Dinyayekî
Têr û şa

Em dixwazin
Li dinyayek
Bijîn bê çek lo

Em dixwazin
Li dinyayek
Bijîn azad lo

Dinyayekî
Bi hevdemî
Dinyayekî
Bi harmonî


Dinyayekî
Dinyayekî
Dinyayekî
Têr û şa

Gaziya me
Ji her kesî re
Bêjin bi me re

Vê sitranê
Vê dîlanê
Bigrin bi me re

Dinyayekî
Bi hevdemî
Dinyayekî
Bi-harmonî

Dinyayekî
Dinyayekî
Dinyayekî
Têr û şa



# HECHECIK

*Awaz : A. Gernas*
*Peyv: K. Burkay*




Hechecik li hewa wek balerîn
Xwe berdide, şa û bextewar e

Li ber ba reqsê dike, dilîze
Bi lezî sermest, bi xwe bawer e

Hêlîna wê li hewş û malan e
Bêxem, aştîxwaz û dilovan e

Dema baranê, meha nîsanê
Bengiyê warê bav û kalan e



# BERF Û BARAN

*Awaz û peyv : A. Gernas*




Ewrên li esman reş dibin
Birq û birûskan lê dixin
Şilî û baran dibare
Lehî bi erdê dikeve

Bikevin binê sîwanê
Şil nebin ber baranê


Ewrên li esman gewr dibin
Serma û seqem der dibin
Befir û zîpik dibarin
Zevî û dar sipî dibin

Li xwe kin hûn kincên germ
Ji bo ku hûn negrin zekem



# AŞTÎXWAZ IM

*Awaz û peyv : A. Gernas*




Aştîxwaz in
Şer naxwazin

Hezkirinê
Biratiyê
Dilşahiyê
Em dixwazin

Çi sipî û çi zer
Çi reş û esmer
Bûne seferber
Naxwazin şer

Em dikin geş
Dinyaya xweş


Pêşeroja
Milet in em
Guh bidin me
Bang dikin em

Çi sipî û çi zer
Çi reş û esmer
Bûne seferber
Naxwazin şer



# AV Û ÇIYAYÊN NÎŞTIMAN

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Werin nas bikin
Çiya û golan
Çem û bendavan
Avên nîştiman

Sîpan û Agirî
Gabar û Cûdî
Nemrûd û Şerefdîn
Sason û Dersîm

Xelat û Zagros
Pelandokan û Toros
Munzûr Û Mûrad
Tendûrek û Mereto

Mezintirîn gol
Gola Wanê ye
Û duyemîn gol
Gola Hezar e


Ji Gola Nemrûdê
Bedewtir tune
Golek volkanîk e
Navsera çiyê

Gola Erçekê
Masîgol û Nazlûkê
Gola Pasînê
Û bendava Kebanê

Çemên warê me
Av û kaniyên jiyan
Çar aliyê me
Dixemlînin niştiman

Dîcle û Firat
Aras û Mûrad
Pêrî û Munzûr
Xerzan û Xabûr

Avareş û Ereb
Çaxçax û Botan
Malabadê, Pasîn
Û hin çemên din



# NEWROZ

*Awaz : Enwer Qeredaxî*
*Peyv : A.Gernas*




Newroz e serê salê
Bîst û yekê Adarê

Ew cejna me Kurda ye
Pîroz û pir biha ye

Her sal hûn agir vêxin
Li dora wî hilperin

Li xwe kin cilên delal
Hev pîroz kin wek heval

Newroz e serê salê
Bîst û yekê Adarê



# PÊŞIYÊN ME

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Bavê me û kalê me
Li ser vê xakê bûne
Av dane û çandine
Derd û belayê wê dîne
Tî mane û jar mane
Bê gazin razî bûne
    Em Kurd in, şaristanî
    Em Gotî û Mîtanî
Zor dîne û can dane
Lê bi rik di ber xwe dane
Dîl bûne û kor bûne
Ji welat derneçûne

Şer dîne û şîn dîne
Xaka xwe parastine
    Em Kurd in, şaristanî
    Em Medyayî, Kardoxî
Kok dane û zîl dane
Bi vê axê ve keliyane
Keç dane û kur dane
Li seranser şax dane
Şar – bajar çêkirine
Li xaka Gulistane
    Em Kurd in, şaristanî
    Em Eyûbî, Merwanî



# DAXUYANÎ

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Li daristanê civiyan
Biçûk, mezin hemû heywan
Ji her der
Bi hev şêwirîn pirsên xwe
Deranîn pêş gazinên xwe
Bi keser
Bijî, bijî daristan
Bijî hemû heywan
Bijî xweşî û jiyan

Piştî dîtin û pêşniyar
Aşkera bû derd û xisar
Bi carek
Biryar dan ku binivîsin
Dinyayê pê bihisînin
Bi carek
Bijî, bijî daristan
Bijî hemû heywan
Bijî xweşî û jiyan

Hedefa gilî, gazinan
Yên ji xwe ra dibên ÎNSAN
Û beşer
Neşewitînin daristan
Nekujin tu teyr û heywan
Û ruhber
Bijî, bijî daristan
Bijî hemû heywan
Bijî xweşî û jiyan

Bi qanûn û him jî yasa
Bê parastin dar û xweza
Li her der
Neyê qirêjkirin hewa
Bi gaz û zift û bi cîwa
Û bi şer
Bijî, bijî daristan
Bijî hemû heywan
Bijî xweşî û jiyan



# DÎLANA BIRATÎ

*Awaz : Biyanî*
*Peyv : A.Gernas*




Bi destê hev bigrin
Bi hev re em bileyzin
Govend û giranî
Hilperin bi ciwanî
Bi def û bi zirneyan
Bi sitran û dengbêjan
    Bi destê hev bigrin
    Bi hev re em bileyzin

Em hemû digel we
Dest bidin em destên we
Nakokî, nexweşî
Rû nade qet li nav me
Em jî rojek wek we
Welat dibin birêve
    Bi destê hev bigrin
    Bi hev re em bileyzin



# MEŞA MINDALAN

*Awaz û peyv : A.Gernas*






Carek ji caran
Ji bo zarokan
Keçeka ciwan
Ket rê û dirban

Ji her welatek
Derket zarokek
Dan dû keçikê
Meşiyan gelek

Daxwaziya wan
Ji hemû cîhan
Bidin zarokan
Azadî, jiyan

Bêne parastin
Neyên zêrandin
Têr şekir bixwin
Û têr bileyzin





# ZÛ NE DERENG

*Awaz û peyv : A.Gernas*





Em dixwazin bileyzin li hawirdor
Bixwînin stranên xwe yên curbicur
Em nebînin, nebihîzin tirs û zor
Dixwazin zû, zû ne dereng

Bêtirs hevdu bibînin tim keç û law
Hezkirin nebe dîlê, dilê bi saw
Bedewî nekeve binya şar û caw
Dixwazin zû, zû ne dereng


Kevok teqle bavên li rûyê esman
Kew bifirin li ser şax û geliyan
Gur êrîş nebin ser pez û mihan
Dixwazin zû, zû ne dereng

Dibistan bi zarokan gişt şên bibin
Daristan li her çaralî gul vedin
Kolan bi aştîxwazan geş bibin
Dixwazin zû, zû ne dereng



# HEVALÊ MIN

*Awaz û peyv : A. Gernas*




Hevalekî min heye
Meriv tim pê bawer e
Hevalekî min heye
Ji bo min ew piştgir e

Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye
Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye

Ji hevalê xwe razî me
Ji ber ew min şa dike
Hevalê min bi çîk e
Derd û şahî par dike

Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye
Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye

Hevaltî çiqas xweş e
Ger tune be xapandin
Hevaltî çiqas xweş e
Ger tim hebe hezkirin

Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye
Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye



Ez û tu, hevalê min
Bi hev re gelek xurt in
Ez û tu, hevalê min
Tu dijwarî nas nakin

Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye
Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye

Hevaltî çiqas xweş e
Ger tune be xapandin
Hevaltî çiqas xweş e
Ger tim hebe hezkirin

Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye
Hevalê min heval e
Hevalê min hêja ye



# MALBATA MIN

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Li warê min şîn û şer e
Agir dibare, bager e
Malbata min koçmal bûye
Hêj çend ji me li wir mane


Li wê derê bombe diteqin
Li wê derê zarok diqîrin
Malbata min bê star maye
Hêj çend ji me li wir mane

Li wê derê sêwî dimînin
Zarok stûxwar dimînin
Pir qurban daye malbata min
Hêj çend ji me li wir mane



# ŞÊT Û ZÎREK


*Awaz û peyv: A. Gernas*






Zarokek şêt :
Ez lawekî pir şêt im
A Bi kêfa xwe dilivim
Ez çi bixwazim dikim
Kesî guhdarî nakim

De hun werin zarokno
B Hun werin bidin dû min
Guh nedin dê û bavan
Hun bibin hevalê min

Zarokên zîrek :
Em nadin dû te na, na
C Na na na na na na na
Nabin hevalê te na
Nabin wekî te na, na







Em mindalên zîrek in
A Dixwînin û dinivîsin
Di wextê de dilîzin
Di wextê de radkevin

Nakin pîsî û xirabî
B Divê tu jî wek me bî
Bi kesî re şer nakin
Em ji hev hez dikin

Dev ji tolazî berde
C Wer bibe hevalê me
Bijî jînek serûber
Bibe merivek biber

Zarokê şêt :
We ez kirim poşman e
A Li başiyên jiyan e
Dixwînim û fêr dibim
Ji xirabî dûr dibim

Hemû zarok :
Em bi hev re bilîzin
B Em şerê hevdu nekin
Ji hevdu em hez bikin
Bi aqil bin xwe baş kin

Her zarokek cîhanek
C Wek şahî û dîlanek
Pêşeroja milet in
Ger zanibin çi dikin


# BARAN

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Baran dibare
Axê av dide
Darber şîn dibe
Baran jiyan e
    Baran xweşî ye
    Baran jiyan e
Hin caran baran
Hûr hûr dibare
Dilê însanan
Kelekel dibe
    Baran xweşî ye
    Baran jiyan e

Hin caran baran
Radike tofan
Dibe êş û jan
Lê dîsa jî jiyan
    Baran xweşî ye
    Baran jiyan e




# KERGUH

*Awaz . Ferîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*




Ker guh lı kozikê
Guh pêle ser piştê
Çavan girte pirxe pirx
Pirxepirx pirxepirx, pirxepirx
Seydvan hat û gote pix, gote pix

Ew dem mûç kir guhê xwe
Reviya ji cihê xwe
Birev kerguh hat neyar
Hat neyar, hat neyar
Xwe berde çol û beyar



# HILPERÎN

*Awaz . Ferîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*




Em hemû destê hev bigrin
Bi hev re em hilperin
Gulşênî, şêxanî
Hilperin bi ciwanî
Bi def û zirneyan
Bi goranî û semayan

Em hemû bi destê hev bigrin
Bi hev re em hilperin

Em mindal digel we
Dest dixin nav destê we
Nakokî û nexweşî
Xwe rê nade li ba me
Em jî rojekî wek we
Welat dibin bi rêve

Em hemû bi destê hev bigrin
Bi hev re em hilperin



# DAYÊ CAN


*Awaz û peyv : A. Gernas*




Tu neweste dayê can
Bi erk û kar û ferman
Diya min a xemrevîn
Devbiken û zar şîrîn

Dema ez te dibînim
Şabûnê bi bîr tînim
Ji bîr dikim westanê
Kar, erkên dibistanê

Xweştir ji hemûyan
Rûdinêm li ser çokan
Bi hezî û maçên germ
Dikevim xew, nakim xem



# ZANÎN

*Awaz û peyv : A.Gernas*




Tu ker î, bêhiş î
Bar li pişt, serpêl î
Ji zirînê pê ve
Qet tiştek nizanî
Heta tu ev ker bî
Tê tim bin bar de bî

Rûvî yî, xasûk î
Xwedî hezar fen î
Bixwe ne tiştek î
Bi lîstik xilas dibî
Her dem pere nake
Ger, fen xilas nake

Tu şêrê bi qewet
Bi saw û bi hêbet
Bi hêz û bi pençe
Nêçîr dikî hilbet
Ji qewetê meztir
Aqil e bi hêztir

Bi aqil bilive
Bi hêz be metirse
Xasûkî pêwîst e
Ji bêhişî dûr be
Ev e bo te rêber
Bi zanîn tevbiger!



# TIRAL


Awaz : **Enwer Qeredaxî**
Peyv : **A.Gernas**



Xweperestê tiral
Riswa û bê pergal
Bi rûniştin û bi razan
Bextewar nabe însan
    Xweperestê tiral
    Riswa û bê pergal

Kar bike û zindî be
Rabe û jêhatî be
Bi ber û berhemdar be
Zana û kêrhatî be
    Xweperestê tiral
    Riswa û bê pergal

Riya serketinê
Tevger û zanînê
Xwendin û xebat e
Xîret û sebat e
    Xweperestê tiral
    Riswa û bê pergal



# PÊŞWAZÎ

*Awaz . Ferîd Nadhar*
*Peyv : A. Gernas*





Dema mêvanek
Hate mala we
Bêjin! Bi xêr hatî
Çawa yî, baş î

Gava rabûn çûn
Gotin, xatirê we
Bêjin! Oxir be
Ser çavan hatî



# SILAV


*Awaz . Enwer Qeredaxî*
*Peyv : A. Gernas*




Serê sibehê
Rabûy ji xewê
Bibêje ROJBAŞ, ROJBAŞ
ROJBAŞ û ROJBAŞ

Tarî ket erdê
Berê êvarê
Bêje ÊVARBAŞ, ÊVARBAŞ
Li we ÊVARBAŞ

Berî razanê
Bêje dê û bavê
Bibêje ŞEVBAŞ, ŞEVBAŞ
ŞEVBAŞ û ŞEVBAŞ



# BI XÊR HATIN


*Awaz û peyv : A.Gernas*




Bi xêr hatin ser çava
Dê û bavên pir hêja
Îro li pêşberî we
Me nîşan da çend wêne

Ji dinyaya mindalan
We dît gelek huneran
Nebên mindal biçûk in
Fama tiştekî nakin

Him zîrek in him jîr in
Xwedî karên bi pîr in
We guh da me pir bi bal
Spas dikin em mindal







# KOROYA ZAROKAN

# A ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A DIYARBEKIRÊ

Ji sala 1999'an vir ve Koroya Zarokan a Şaredariya Bajarê Mezin xebat û çalakiyên xwe didomîne. Her sal bi azmûnê zarokên ku temenê wan di navbera 6 û 16 salan de ye tên helbijartin. Ên ku temenê wan ji 16 saliyê mezintir in ji koroyê derdikevin û di dewsa wan de yên nû tên hilbijartin. Koro bi vî awayî sal bi sal nû dibe. Bi rêberiya mamosteyên hêja ev koro xebatên xwe didomîne.

Koro bi tenê ji vokalan pêk nayê. Perwerde û xebatên muzîkê jî bi dorfirehî tên ıneşandin. Ev xebat rojên şemî û yekşeman di navbera saetên 13:00 û 15:00'an de bi domdarî tên meşandin.

Xebat û çalakiyên muzîkê yên ku tên kirin pirzimanî û pirzar-avayî ne. Bi kurdî, tirkî, ermenkî, kirdkî û hwd. tên kirin. Her wiha hîndekariya solfej û notayan jî tê kirin.

Sedemên ku ev koro hatiye avakirin; xwedîderketin, parastin û pêşdebirina çand û hunerê ye. Xwedîderketina li zarokan, xwedîderketina li nirxên gel e. Her wiha ji aliyê civakî û çandî ve xizmeta pêşketina civakî ya zarokan sedemeke bingehîn a cîhanê ye. Bi vî awayî xem û xeyalên zarokan ew ê berfirehtir bibin û ew ê ji nifşên pêşerojê re çanda muzîkê ya durist û baş wekî mîrate bimîne...

Koroya Zarokan a Şaredariya Bajarê Mezin gelek çalakî li dar xistine. Ji nava vê pirtûkê çend stran hatin hilbijartin û ev stran ji aliyê koroyê ve hatin gotin...

## XEBATA CD'YÊ YA KOROYA ZAROKAN

Akordeon: Taşkın GEYİK
Cajon: Veysel İLGİN
Bateri (elektro): Cihan ATÇI
Darbuka-dahol: Celal YÖRÜK
Org: Recep NOYAN
Bas gîtar-akustîk gîtar: Bilal EKİN
Baglama: Ali TURGA, Abdullah KARAKAŞ, Ersin AKER
Gramer: Ali AKTAŞ
Derhinêrê Muzîkê-Aranjor: Ferat MEHMETOĞLU
Studyo: Aydin produksuyon
Şefa Koroyê û Derhinêr: Kısmet BİNGÖL

## VOKAL

Duygu AYKUT
Mervenur MERAL
Mazlum MAYDA
Jiyan CİHANGİR
Beritan YÜCEL
Yekbun BİNGÖL
Mahmut MAYDA
Azadcan BAKAL
Kadir TURAN
Rewşan ŞENGÜL
Ümmügülsüm GÖÇTÜRK
Fıraz PERİŞAN
Türkan AKBAŞ
Nujiyan ŞAHİN
Berat DALGIN
Nihat ÇELİK
Uğur YILDIRIM
Mizgin ATEŞ
Botan GAZANRİ

# WÊNEYÊN KOROYA ZAROKAN











# BAXÇEYÊ ZAROKAN

ARAM GERNAS

Baxçeyê Zarokan

"Gava ku mîlyar zarok bin mirov ji bo wan çi jî bike têr nake, ku ev zarok zarokên kurdan bin ev girîngtir dibe. Zarokên kurdan zaroktiya xwe najîn, di nava şer û pevçûnê de mezin dibin. Zarokên kurdan wekî zarokên dinyayê najîn. Zarokên kurdan wekî kulîlkên ber devên kaniyên avzelal in, lê ji wê ava zelal têr avê naxwin. Zarokên kurdan tî û birçiyê aştiyê, azadiyê, xweşiyê, dilşadiyê ne. Zarokên kurdan bi hesreta lîstikên zarokane, yên bi muzîk û şahiyê ne."